

Agahdariya beşdaran

Berpirsyara lêkolînê ya seranserî welatî

Profesor, serdoktor Anna Karin Wikström
Klînîka jinan, Nexweşxaneyê Akademiskayê, Uppsala
E-poste: anna-karin.wikstrom@kbh.uu.se

Destpêk

Ji te tê pirsîn ku tu beşdarî lêkolînekê bibî ku armancê ew e lê bikole ka mirov dikare hêj di destpêka hamîlebûnê de pêşbîniyê bike bê kîjan jin di dema hamîlebûnê de dê tûşî aloziyan bibin. Ji hemû jinan yê ku di destpêka hamîlebûnê de fehisa sonarê dikin tê pirsîn ku di lêkolînê de beşdar bibin. Bala vê lêkolînê di destpêkê de dê li ser preeklampsiyê [bilindbûna tensyona/zexta jina hamîle di destpêka hamîlebûnê de] be, lê di qonaxeka paştir de dê li ser aloziyên din jî, wek mezinebûn (ango, zarokekê biçûk bi nisbeta dirêjîya hamîlebûnê) û zayina pêşwext, be.

Beşdariya te di lêkolîna IMPACTê de dilxwazî ye û her gava tu bixwazî tu dikarî biryarê bidî ku beşdariya xwe bi dawî binî. Ev dê tesîrê li sexbêrkirina te ya tibî neke. Ev lêkolîn dê li gelek klînîkên jinan li Swêdê bê bi rê ve birin.

Derbarê lêkolînê

Preeklampsiyê, mezinnebûn û zayina pêşwext sê aloziyên bixeter yê herî belav di dawîya hamîlebûnê de ne. Ev sê alozî dikarin bibin sebaba nexweşbûn û di hin rewşên kêmdîtî de jî mirina zarokê nûjidayikbûyî û preeklampsiyê ji sebebên herî belav e ku jina hamîle bi djiwarî nexweş dibe. Pir zehmet e ku mirov di destpêka hamîlebûnê de bizane ka ev alozî li ba kîjan jinê peyda dibin. Armanca vê lêkolînê ew e ku fehsên screeningê yê baş pêş bixe da ku mirov karibe bibîne ka rîska peydabûna van aloziyan li ba jina hamîle bilind yan nizm e û bi vî awayî lînêrîneka taybetî di dema hamîlebûnê de pêk bîne û heger hewce bike çareseriyeka rêlibergir bi kar bîne.

Serdan di hefteya 11ê heta 14ê de

Gava di hefteya 11-14 ya dema hamîlebûnê de fehisa/miayeneya rûtînî ya pêşîn ya sonarê yan ya sonar-biyokîmyayî (KUB) ji bo te kirin, tu bi vê lêkolînê tê agahdar kirin û heger tu biryarê bidî ku tê de beşdar bibî, tu dê di lêkolîna IMPACTê de qeyd kirin. Ew dê wê maneyê ku tu dê qebûlnameyeka beşdarbûnê îmza bikî û alîkareka sisterê/hemşîreyê, pîrikek yan doktorek hin pirsan li ser hamîlebûn û jiyana te ya rojane ji te bike. tansiyon/zext, dirêj û giraniya tê dê bîn pîvan û her weha tehlîleka xwînê - ku lûleyek e ku têra 10 ml dike (û carina mimkin e tehlîleka xwînê ya cemidandî ya ji KUBê li şûna wê bê bi kar anîn) - bê standin. Ev hemû bi ser hev re 20 deqîqeyan dom dike. Digel miayeneya sonarê, hin navend [û klînîk] dê bi rêya sonara Dopplerê li demara xwînê ya ku diçe malzarokê binêrin.

Banka biyolojîk (tehlîla xwînê ya zêde)

Îmkana hin nexweşxaneyan yê ku di vê lêkolînê de beşdar in heye ku îstîfadeyê ji bankeka biyolojîk bikin. Heger tu aîdî nexweşxaneyeka weha bî, mîmkîn e hin tehlîlên din yê xwînê yê zêdetir (2 lûleyên 10 ml û yeka 5 ml) bîn kirin û di bankeka biyolojîk ya girêdayî wê nexweşxaneyê ya ku tu aîdî wê yî bîn cemidandin. Navê banka biyolojîk ya ku halê hazir bi te eleqedar e Banka biyolojîk ya Uppsalayê ye û agahdariyên têkiliya wê ev in: <http://www.uppsalabiobank.uu.se/sv>, Uppsala Biobank Dag Hammarskjölds väg 38, 5 tr UCR, Uppsala Science Park, Hubben 751 85 Uppsala, info@uppsalabiobank.se.

Hemû agahdariyên şexsî û tehlîlên tîrîkirin û bê nav tîrî xebitandin. Di paşerojê de îmkana lêkolînanan dê hebe ku piştî qebûlkirina heyeteka pirsên exlaqî ji komîteya lêkolînanan ve lêkolînê daxwaz bikin ku îstîfadeyê ji tehlîlên xwîne yê di banka biyolojîk de mayî bikin. Ev dê ji bo lêkolînanan eleqedar be yê ku armanca wan ew e ku nîşanên biqîmet yê aloziyên hamîlebûnê kifş bikin. Hingî kes nikare şexsan yê ku tehlîlên xwîne ji bo lêkolînê dane nas bike, lê tenê agahdariyên şîfrekirî dê bê tenê teslîm kirin.

Feyde, rîsk û ewlehî û êminî

Ev lêkolîn dê di hamîlebûna te ya niha de ti feydeyan nede te, lê dê feydeyan bide nîşanên paşerojê yê jinên hamîle li Swêdê. Mimkin e tu jî di hamîlebûnê de jê îstîfade bikî. Mimkin e girtina tehlîla xwîne ji bo hinan nerehet be û carina deqeka reşûşin ya biçûk peyda bike.

Beşdarbûn

Heger tu beşdarbûnê qebûl bikî, her gava tu bixwazî tu azad î xwe ji lêkolînê vekîşî bîyê ku tu sebebê bidî û ew tesîrê li sexbêrkirina te di lîvê nexweşan de nake. Her gava tu bixwazî tu dikarî tehlîlên xwe yê xwîne paşde vegerî (û ew hingî tîrî telafî û pûç kirin) û ji agahdariyên derbarê te û hamîlebûna te poşman bibî.

Bi gîştî

Tu dikarî agahdariyên zêdetir derbarê lêkolînê ji berpirsaryê lêkolînê yê ku li nexweşxaneyê te ye (li agahdariyên jêrê binêre) peyda bikî. Ne lazim e ku tu bersiva hemû pirsyan yê ku di pêşwaziyê de tîrî kirin bidî û kengî tu bixwazî tu dikarî hevpeyivîna bi dawî bî.

Xebitandina agahdariyên şexsî

Zanîngeha Uppsalayê ji agahdariyên te yê şexsî berpirsaryê e. Kesên ku beşdarî lêkolînê bûne dê di encamên dawî yê lêkolînê de neyê behs kirin. Qeyda hamîlebûnê karê bihevregirêdana agahdariyên şexsî, netîceya hamîlebûnê û tehlîlên xwîne dike û lewra lêkolînanan dikarin tenê ji agahdariyên şîfrekirî îstîfade bikin. Raport tenê li ser koma şexsan tîrî berhev kirin. Tenê berpirsaryê lêkolînê li nexweşxaneyê te û Qeyda hamîlebûnê dikarin li ser agahdariyên neşîfrekirî bixebitin da ku agahdariyên derbarê hamîlebûna te, zarokanî te yan zarokê te yê nûjidayikbûyî binirxînin û temam bikin. Agahdariyên şexsî li gor qanûna parastina agahdariyan ya nû ya Yekîtiya Ewropayê (GDPR) tîrî xebitandin. Tu dikarî daxwaznameya xwe ji Nûneriya parastina agahdariyan (region.uppsala@regionuppsala.se) re bişî. Bersiv û agahdariyên te dê wisa bê parastin ku kesên neeleqedar nikaribin bibînin.

Tehlîlên baka biyolojîk

Tehlîlên ku ji bo lêkolînê tîrî kirin dê li gor Qanûna bankên biyolojîk di lîvê saxlemî û nexweşan de (SFS 2002:297) - ya ku çawaniya parastin û bikaranîna tehlîlan tenzîm dike - bibin aîdî banka biyolojîk ya Uppsalayê (nimreya qeydê 827 li ba Mifetişiya lîvê û sexbêriyê (IVO)). Tehlîlê dê şîfrekirî bê parastin û maneyê wê ew e ku kes nikare tehlîlan rasterast bi şexsê te ve girê bide. Ji bo her tehlîlê şîfreyeka yekane û taybetî heye da ku tevlihevî çê nebe. Tehlîlê û lîsteya wan ya nasîne (kilîda şîfreyê) dê ji hev cuda û dûr ji kesên neeleqedar di banka biyolojîk ya Uppsalayê de bê parastin. Kilîda şîfreyê dê bi berpirsaryê lêkolînê û qeyda hamîlebûnê re bê parve kirin. Heqê lêkolînanan dê hebe ku îstîfadeyê ji banka me ya biyolojîk û agahdariyên hamîlebûnê yê pê ve eleqedar bikin piştî ku projeyê ji aliyê exlaqî ve bê qebûl kirin. Mimkin e tehlîlên te yê xwîne ji bo analîzê ji laboratûwara me re yan ji laboratûwara hevkarê me di nav Yekîtiya Ewropayê (EU/EES) de û derveyî wê û USAYê re bê şandin. Mimkin e proteîn, hormon û jen [gen]

bên analîz kirin. Her weha, mimkin e bi rêya şopandina qeydên saxlemî û kalîteyê yên Swêdê lêkolîn li ser nexweşiyên ku di paşerojê de li ba te yan zarokê te peyda dibin bê kirin. Heger lêkolînan bixwazin qeydên saxlemî û kalîteyê bişopînin, hingî qeyda hamîlebûnê û daîreya eleqedar dê agahdariyan bixebitînin. Lêkolînan tenê dê agahdariyên nenaskirî werbigirin. Heqê te heye ku tu bêyî îzahkirin daxwaz bikî ku tehlîlên te yên xwînê bên pûç kirin û agahdariyên te bên avêtin.

Encam û netîce

Encama lêkolînê dê di kovarên tibî de bê weşandin û di malpera lêkolîna IMPACTê de berdest be. Kes dê nikaribe encamên te yên şexsî bibîne.

Qebûlkirin

Heyeta nirxandina pirsên exlaqî ya herêmî li Uppsalayê ev lêkolîn qebûl kiriye.

Berî tu biryarê bidî, giring e tu fehm bikî ku qîmeta vê lêkolînê ji bo te çi ye. Heger hin pirsên te yên din hebin yan hin agahdarî li ba te nebin, ji şewirkarê xwe yan ji kesekî ku navê wî li jêrê ye bipirse. Heger tu bixwazî beşdar bibî, em rica dikin ku tu forma "Informerat samtycke" [Qebûlkirina agahdarkirî] îmza bikî. Piştî nuxyekê wê dê ji te re were.

Berpirsyar (Berpirsyarê/a serekî û berpirsyarên herêmî dê di agahdariyên herêmî yên ji bo nexweşan de bên qeyd kirin)

Berpirsyara serekî û herêmî li Uppsalayê:

Anna Karin Wikström Serdoktor, profesor
Kvinnokliniken, Akademiska sjukhuset
75185 Uppsala
Anna-karin.wikstrom@kbh.uu.se

Berpirsyarên herêmî li Göteborgê:

Ylva Carlsson Serdoktor, doktora tibê
VÖL Ultraljudsenheten
Sahlgrenska Universitetssjukhuset/ Östra
Diagnosvägen 15
416 85 Göteborg
E-poste: ylva.carlsson@vgregion.se

Bo Jacobsson Serdoktor, profesor
Sahlgrenska Universitetssjukhuset/ Östra
Diagnosvägen 15
416 85 Göteborg
E-poste: bo.jacobsson@obgyn.gu.se

Berpirsyarê herêmî li Nexweşxaneyê zanîngehê ya Skåneyê:

Stefan Hansson Serdoktor, profesor

Perinatale enheten
Skånes universitetssjukhus
205 02 Malmö
E-poste: stefan.hansson@med.lu.se

Berpirsyarên herêmî li Stockholmê:

Peter Conner Serdoktor, docent
Centrum för Fostermedicin
Patientflöde komplicerad graviditet och förlossning
Karolinska Universitetssjukhuset Solna
171 76 Stockholm
E-poste: peter.conner@karolinska.se

Anna Sandström Doktora taybetî, doktora tibê
Avdelningen för Klinisk Epidemiologi, T2, Institutionen för Medicin, Solna
Karolinska Sjukhuset
17176 Stockholm
E-poste: Anna.sandstrom@ki.se

Peter Lindgren Serdoktor, docent
Patientflödeschef Centrum för Fostermedicin
Karolinska Universitetssjukhuset
171 76 Solna
E-poste: peter.lindgren@sll.se

Marius Kublickas Serdoktor, docent
CFM Huddinge
Centrum för Fostermedicin, K79
Karolinska Universitetssjukhuset
141 86 Huddinge
E-poste: Marius Kublickas@ki.se

Berpirsyara herêmî li Dalarnayê

Lina Bergman Doktora taybetî, doktora tibê
Kvinnokliniken, Falu lasarett
Lasarettsvägen 10
79131 Falun
E-mail: lina.bergman@kbh.uu.se